# Şideta malbatî

Alîkarî li vê derê heye
Tundîya navmalbatî çi ye?
Ji bo qurbanîyan şîretkarî û parastin
Alîkarîya kesên qurbanî
Zarok
Tundîya cinsî
Mafê şênîbûnê
Tacîz
Zewaca bi zorê û kêrkirina jinê (sinet)
Temen û Miqatebûn

# Alîkarî li vê derê heye

Di tundîya navmalbatî de sitandina alîkarîyê giring e! Çendîn dezgeh zanîyarîyê, şîretê û destekê pêşkêş dikin. Ev xizmet gelekê caran veşartî ne, pirê caran miftîbelaş in û eger bivê, tevlî wergêrekî pêşkêş dibin. Ji bo van deveran alîkarî heye.

## Di lezgînîyê de

- Polîs 112 / Ambûlans: 144
- Sitargehên jinan: AppElle! (24/7 tora germ), (24/7 tora germ), 031 533 03 03
- Jora lezgînîyê ya nexweşxaneyê: Bêyî randevûyê li jora lezgînîyê ji bo birîndarîyan dermankirin heye
- Lezgînîya psîkîyatrîk: Li gora deverê lîsta cîhên têkilikîrinê li vê derê ye www.psy.ch

Bêtir zanyarîya alîkarîya lezgînîyan li vê derê ye.

## Şîretkarîya ji jinan û zarokan re

Veşartî û miftîbelaş. Wergêrekî devkî mumkine.

- Kantona Bernê: Desteka Qurbanîyî ya Bernê (Opferhilfe Bern), 031 370 30 70, www.opferhilfe-bern.ch (DE | FR)
- Herêma Biel/Bienne: Hevgirtina Jinan (Solidarité Femmes), 032 322 03 44, www.solfemmes.ch (DE | FR) yan Navenda LAVIyê, 032 322 56 33, www.opferhilfe-biel.ch (DE | FR)
- Herêma Thun-BO: Vîsta, 033 225 05 60, www.vista-thun.ch (DE)
- Bajarê Bernê: Beşa Tundîya Navmalbatî (Fachstelle Häusliche Gewalt), 031 321 63 02, www.bern.ch/fhg (DE)
- Sitargehên jinan: AppElle! (24/7 tora germ), 031 533 03 03

## Şîretkarîya ji bo her kesî

Veşartî û miftîbelaş. Wergêrekî devkî mumkine.

- Kantona Bernê: Desteka Qurbanîyî ya Bernê (Opferhilfe Bern), 031 370 30 70, www.opferhilfe-bern.ch (DE | FR)
- Bajarê Bernê: Beşa Tundîya Navmalbatî (Fachstelle Häusliche Gewalt), 031 321 63 02, www.bern.ch/fhg (DE)
- Alîkarî û Dest (Dargebotene Hand): Şîretkarî 24/7, têl. 143, www.143.ch (DE | FR)

## Zarok û kesên xort

Zarok û kesên şort ên rewşa wan a malbatê ne baş e dikarin bi roj û bi şev bi Pro Juventute-ê re biaxifin. Bi têlefonê, çetê, peyama nivîskî yan bi emaîlê.

- Pro Juventute: Şîretkarîya veşartî û miftîbelaş 24/7, têl. 147, www.147.ch (DE | FR)

Sitargeha awarte ya Pluto'yê sitar, parastin û ewlehiyê di rewşa awarte da raberî kesên ji 14 heta 23 salî dike. Bi awayê belaş

- Sitargeha Awarte ya Pluto'yê: 078 247 24 44, www.pluto-bern.ch

Eger gumana destdirêjîya zarokan heya 16 salan tê kirin, koma parastina zarokan a Nexweşxaneya Unîversîteyê (Inselspital) şîretan li zarokî, xwedîkiran û pisporan dike.

- Nexweşxaneya Unîversîteyê koma parastina zarokan (Kinderschutzgruppe Inselspital): 031 632 94 86, www.kinderklinik.insel.ch/de/unser-angebot/kinderschutz (DE)

## Tundûtûjî di Miqatebûnê da û Extiyar

Kesên ku piştevaniya xizmên xwe yên dilsoj werdigirin, li vir piştevaniyê bi dest dixin. Nihênî û belaş.

- Ofîsa lêpirs ji bo mijarên têkildarî extiyarbûn, miqatebûn û malê: 031 372 27 27, www.ombudsstellebern.ch
- Navendên Şêwirîna Piştevaniya Qurbaniyan: sserdana pêşniyazên jor bike
- Aliyê Pêşniyazkirî: Şêwirîna 24h/7, Telefon. 143, www.143.ch

Kesên extiyar jî dikarin di rewşa qewimîna pevçûnê da ji vir alîkariya nihênî û belaş wergirin:

- Navenda Şêwirîna Serbixwe ya UBAyê ji bo Extiyaran: 0848 00 13 13, www.uba.ch

## Desteka leşsaxîyê û lexsaxîya dadgehî

Lezgînîya Bajêr (City Notfall) a li Bernê li ser birîndarîyên piştî tundîya fizîkî û berhevkirina delîlan bûye pispor. Lêpirsîn veşartî ne. Bi tenê eger qurbanî vê yekê bixwaze haya polîsî pê tê xistin. Kesên li cîhên din dermankirina leşsaxîyê li ser wan pêk tê divên ji diktorî bixwazin ew nîşanên tundîyê bibelge bike.

- Ji bo qurbanîyên tundîyê xala têkilîkirinê ya leşsaxîyê: Lezgînîya Bajêr (City Notfall) Bern, 031 326 20 00, Schanzenstrasse 4a, 3008 Bern, www.citynotfall.ch/de/postparc-bern (DE)
- Li nirxandina diktorekî malbatî yan li lezgînîya nexweşxaneya herî nêz

## Tundîya cinsî

- Jin û keçên 16 salan an mezintir: Nexweşxaneya Unîversîteyê ya Bernê (Inselspital Bern), Klînîka Unîversîteyê ya Jinikologîyê, 031 632 10 10, Friedbühlstrasse 19, Theodor-Kocher Haus, 3010 Bern, www.frauenheilkunde.insel.ch/de/sexuelle-gewalt-gegen-frauen (DE)
- Mêr û kesên tesîrdîtî yên temenê wan 16 û bêtir: Navenda Lezgînîyê ya Unîversîteyê – Nexweşxaneya Unîversîteyê ya Bernê (Universitäres Notfallzentrum Inselspital Bern), 031 632 24 02, Freiburgstrasse 16c, 3010 Bern, www.notfallzentrum.insel.ch (DE)
- Piştî tundîya cinsî desteka qurbanîyan: Lantana, 031 313 14 00, www.lantana-bern.ch (DE)

## Şîretkarîya ji bo kesên qurbanî

Veşartî. Wergêrekî devkî mumkine.

- Navenda Destwerdanê ya Bernê ya li dijî Tundîya Navmalbatî (Berner Interventionsstelle gegen Häusliche Gewalt): 079 308 84 05, www.be.ch/gewalt-beenden (DE | FR)
- Beşa tundîyê ya pisporbûyî (Fachstelle Gewalt): 0 765 765 765, www.fachstellegewalt.ch (DE)

## Xalên din ên têkilîkirinê

Sîteya webê ya Navenda Destwerdanê ya Bernê ya li dijî Tundîya Navmalbatî (Berner Interventionsstelle gegen Häusliche Gewalt) nûnertîyên din ên karibin alîkarîyê bikin bi rê û zê dike. Wek nimûne, ji bo pirsên li ser koçberîyê, şîretkarîya kurman, alîkarîya qanûnî yan şîretkarîya ji bo rewşên malbatî yên zehmet (lîst bi Elmanî û Fransizî ye).

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-bern.ch/ku/haeusliche-gewalt/diese-stellen-helfen

# Tundîya navmalbatî çi ye?

Tundîya navmalbatî, tundîya di malbatê yan hevjînîyê de ye. Ew ji alî fizîkî û hestî ve birîndar dike. Awayên cuda yên tundîya navmalbatî hene. Tundîya navmalbatî li Swîsrayê qedexekirî ye.

## Tundîya navmalbatî çi ye?

Tundîya navmalbatî, tundîya di malbatê yan hevjînîyê de ye: Di nava kesên zewicandî yan kesên bi hev re bûne de. Ew navên her bi hev re bijîn. Tundîya di nava dêûbavan û zarokan yan di nava birayan/xwişkan de jî tundîya navmalbatî ye.
Tundîya navmalbatî dibe bibe sebebê nexweşînên hişî û yên psîkosomatîk. Tundîya navmalbatî leşsaxî û bipêşveçûna civatî ya zarokan jî diavêje xeterê.

## Kî tesîr dibînin?

Her kesek dikare ji tundîya navmalbatî tesîrdîtî be: kesên ciwan û pîr, kesên xwedî yan ne xwedîyên paseporta Swîsrayê, malbatên dewlemend yan ên xizan. Li Swîsrayê di malbatên yan hevjînîyên xwe de gelek kes jana tundîyê dikişînin. Sitandina alîkarîyê ji qurbanîyan re gelek girîng e.

## Awayên cûrbicûr

Gelek awayên cuda yên tundîya navmalbatî hene – tundîya fizîkî, psîkologîk, zayendî yan aborî. Gelekê caran awayên cuda yên tundîyê di yek carê de peyda dibin.
Wek nimûne: her tim piçûkxistin, qedexakirina temasê, zîndanîkirin, davdan, kontrolkirin, bi zorê bi yekî pêdankirina seksê, ji destî sitandina pere, li yekî qedexekirina hînbûna zimanî û îhmalkirina zarokan. Gefxwarin jî herweha tundîyên navmalbatî ne.

## Tundîya navmalbatî qedexekirî ye

Tundîya navmalbatî qedexekirî ye. Dê doz lê bê vekirin. Eger haya polîsî ji tundîya navmalbatî hebe, kesê rastî tundîyê tê nexwaze jî ew mecbûr e lê bipirse.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-bern.ch/ku/haeusliche-gewalt/was-ist-haeusliche-gewalt

# Ji bo qurbanîyan şîretkarî û parastin

Çendîn nûnertîyên destekkirina qurbanîyên tundîya navmalbatî – bi piranî veşartî ne û miftîbelaş in. Kesên li dora qurbanîyan jî herweha dikarin alîkarî bistînin.

## Di lezgînîyê de

Di lezgînîyê de: Haya polîsî pê bixe (têl. 112).
Jin û zarok li sitargeha jinan dikarin bên parastin. Bi şev û bi roj pisporek bersiva tora alîkarîyê AppElle! dide (têl. 031 533 03 03)
Jimarên lezgînîyê yên bêtir hatine lîstekirin li vê derê ne.

## Şîretkarîya ji Beşa Desteka Qurbanîyî (Opferhilfe)

Navendên şîretkarîya desteka qurbanîyî (Opferhilfe-Beratungsstellen) şîretan li kesên rastî tundîya navmalbatî tên dike û zanîyarîyê dide wan. Ev alîkarî miftîbelaş e. Qurbanî dikarin gavên pêştir bi pisporî re bi hev re pîlan bikin.
Karkir bi veşarîbûnê tevdigerin. Maneya vê ew e ku nayê hiştin ku haya tu kesî ji dan û sitandinan hebe. Heta ne polîs jî

## Ji bo jinan û zarokan desteka qurbanîyî

- antona Bernê: Desteka Qurbanîyî ya Bernê (Opferhilfe Bern), 031 370 30 70, www.opferhilfe-bern.ch (DE | FR)
- Herêma Biel/Bienne: Hevgirtina Jinan (Solidarité Femmes), 032 322 03 44, www.solfemmes.ch (DE | FR) yan Navenda LAVIyê,  yan Navenda LAVIyê, 032 322 56 33, www.opferhilfe-biel.ch (DE | FR)
- Herêma Thun-BO: Vîsta, 033 225 05 60, www.vista-thun.ch (DE)
- Sitargehên jinan: AppElle! (24/7 tora germ), 031 533 03 03

## Ji bo her kesî desteka qurbanîyî

- Desteka Qurbanîyên Bernê (Opferhilfe Bern): 031 370 30 70, www.opferhilfe-bern.ch (DE | FR)
- Alîkarî û Dest (Dargebotene Hand): 24/7 şîret, têl. 143, www.143.ch (DE | FR)

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-bern.ch/ku/haeusliche-gewalt/beratung-und-schutz-fuer-betroffene

# Alîkarîya kesên qurbanî

Her kesê ji alî fizîkî û hestî ve zirarê bide kesên din divê berpirs be û alîkarî bistîne. Guherîna tevgerê dikare di seansên şîretkarîyê de bê hînbûn.

## Ez dikarim ji ku derê alîkarîyê bibînim?

Bernameya Hînkarîya dijberîya Tundîya Navmalbatî ya bernê (Berner Lernprogramm gegen Häusliche Gewalt) hînî mirovan dike ew nakokîyan bêyî tundîyê biçare bikin. Bername ji bo mezinan e. Wergêrekî devkî mumkine. Rûniştina pêşîn miftîbelaş e.
Her kesekî bivê zûzûka bi hinan re biaxife dikare bi Destê Alîkarîyê (Dargebotene Hand) re bi têlefonê, peyama nivîskî, çetê yan emaîlê têkilî bike. Tim û tim hin kes li wê derê ne. Bi şev jî. Bêyî dayîna navî (bi awayê tevahî) dibe bi wan re têkilî bê kirin.
Beşa tundîyê ya pisporbûyî (Fachstelle Gewalt) herweha li ser tundîyê şîretan dike.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-bern.ch/ku/haeusliche-gewalt/hilfe-fuer-gewalt-ausuebende-personen

# Zarok

Ji zarokên li malê rastî tundîyê tên re alîkarî divê.

## Encamên tundîya navmalî li ser zarokan hene

Gava zarok di nava malê de rastî tundîyê tên ew awa li ser bipêşveçûyîna wan tesîreke neyînî dike. Eger zarok yekser rastî tundîyê neyên jî ev awa rû dide.
Hindek zarok bê deng janê dikişînin, hin ên din nîşanên cuda nîşan didin. Wek nimûne: zehmetîyên li xwandingehê, şilkirina binê xwe, êşên serîyî, xerabûnên xwarinê û razanê, teşqeleyên di têkilîkirina zarokên din de yan hêrsokîbûn.

## Ev nûnertî zarokan destek dikin

Navendên şîretkarîya Destekkirina Qurbanîyan (Opferhilfe), gava zarok rastî tundîya navmalbatî tên şîretin li wan dike. Li ser Destekkirina Qurbanîyan (Opferhilfe) zanîyarîya bêtir li vê derê heye.
Xizmeta şîretkarîyê ya hînkarîya Kantona Bernê destekê dide bi saxlemî bipêşveçûyîna zarokan. Zarok û gênc li vê derê, wek nimûne di nakokîyên navmalbatî de dikarin alîkarîyê bistînin.

## Zarok dikarin çi bikin?

Zarokên li malê rastî tundîyê tên divên ji derveyê malbatê bi hin kesan re li ser vê yekê biaxifin. Wek nimûne: mamhosta, karkirên sosyan ên xwandingehê, dêûbavên hevalan yan cîranan.
Dikare bi şev û bi roj ji Pro Juventute re têlefon bê kirin. Pisporên wan ji tu kesekî din re behsa hevpeyvînan nakin. Ew li qurbanîyan guhdarî dikin û ji bo dîtina çareyan alî wan dikin. Têlefonkirinên ji Pro Juventute-yê re miftîbelaş in. Ne lazim e têlefonkir navên xwe bibêjin. Herweha bi peyama nivîskî, çetê yan emaîlê dikare bi Pro Juventute-yê re têkilî bê kirin.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-bern.ch/ku/haeusliche-gewalt/kinder

# Tundîya cinsî

Êrîşên cinsî di hevjînîyê û di nav malê de jî rû didin. Tundîya cinsî awayekî tundîya navmalbatî ye. Ew dikare ji polîsî re bê raportkirin. Digel ku qurbanî nexwaze ji polîsî re wê yekê raport bike jî piştî êrîşê sitandina nirxandina leşsaxîyê giring e.

## Alîkarîya leşsaxîyê

Nexweşxaneya Unîversîteya Bernê (Inselspital Bern) qurbanîyan bi awayekî veşartî derman dike.

- Diktor ji tu kesî re tiştekî nabêje.
- Her tundî tê bibelgekirin. Delîl 15 sal tên veşartin.
- Belge dikarin dû re bên dayîn polîsî. Ev delîlê giring e.
- Diktor dikare bi xizmetên desteka qurbanîyan (Opferhilfe) re hevtêkilî bike.

## Di nava tundîyê û lêpirsînê de

- Qurbanî divên serê xwe – û heta destên xwe jî neşon.
- Eger mumkin be, qurbanî divên neçin tiwalêtê jî.
- Qurbanî divên cil û kincên xwe ji bo nirxandinê bi xwe re bînin (neşûştî).

## Şîretkarîya qanûnî û ya psîkologîk

Navendên desteka şîretkarîya qurbanîyan (Opferhilfe-Beratungsstellen) dikarin desteka qanûnî û ya psîklogîk bidin. Ew bersivên gelek pirsan dizanin. Destek li vê derê heye.

## Ji polîsî re raport bike

Polîs di raportên qurbanîbûna cinsî de xwedantecrîbe ye. Dan û sitandin ji alî kesekî ji heman cinsî ve tên pêkanîn. Gilî, dikare li navenda polîsan bê kirin. Kesekî pêbawer yan pisporekî ji nûnertîya desteka qurbanîyan (Opferhilfe) dikare tevlî were.
Li derveyê saetên karkirinê, yek dikare bi têlefonkirina ji 112ê re xwe bigihîne polês. Jin jî dikarin peyamê daynin vê derê. Jineke polîs a peywirdar dê zûzûka li peyamê vegere.

- Polîsê kantonê ji bo jinan têlefona têkilîkirinê: 031 332 77 77 (mekîneya bersivdayînê)

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-bern.ch/ku/haeusliche-gewalt/sexualisierte-gewalt

# Mafê şênîbûnê

Sitandina şîreta kesîn girîng e! Li nûnertîya desteka qurbanîyan axaftina bi hin kesan re (Opferhilfe) tu car nabe sebebê jidestçûyîna mafê şênîbûnê. Dan û sitandin veşartî ye. Nûnertîya desteka qurbanîyan (Opferhilfe) ji tu kesekî re tiştek nabêje.

## Eger ji ber sebebê tundîya navmalbatî cihê bûbe mafê şênîbûnê

Eger kesek li Swîsrayê li ser hîmê zewacê dimîne û rastî tundîya navmalbatî bê, ev kes li gora rewşê, piştî devjihevberdanê jî dikare li Swîsrayê bimîne. Her rewş cihê ye. Sebebê çavlêgerandina şîretê ji ber vê yekê giring e.
Navenda desteka şîretkarîya bi qurbanîyan re (Opferhilfe-Beratungsstelle) dikare alîkarîyê pêşkêş bike. Pisporek ji qurbanîyî re behsa gavên wan ên pêş ên rewşa qanûnî û destekê dike. Şîretkarî miftîbelaş e û veşartî ye. Wergêrekî devkî mumkine.

## Bibelgekirina tundîyê

Hebûna delîlê tundîyê giring e. Wek nimûne: fotografên birîndarîyan, gefxwarina di WhatsApp û Facebookê de yan dîmenên ekranên tacîzan. Delîl divên li cîhekî ewle bên veşartin. Wek nimûne, li xanîyê hevalekîyan li cîhê karkirinê.
Ji bilî van jî ji bûyerên tundîyê haydarkirina kesên der û dorê jî dê baş be. Wek nimûne, kesekî ji koma hevalan, ji cîhê karkirinê, ji cîranan yan ji xwandingehê.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-bern.ch/ku/haeusliche-gewalt/aufenthaltsrecht

# Tacîz

Tacîz awayekî tundîyê ye û pirr bi stres e. Axaftina li ser vê mijarê û sitandina şîretan giring e.

## Tacîz çi ye?

Tacîz, bi awayekî pirr çavdêrîya kesekî, têkilîkirina pê re, bidûketina yekî yan aciskirina yekî ye. Ev, bêyî xwastina kesê bidûketî tê kirin. Yên vê yekê dikin bi piranî kesên nasên qurbanîyî ne (partnerên kevn) lê dibin biyanî bin jî.
Wek nimûne: şandina çendîn peyamên nivîskî, emaîlan û peyamên din, li cîhê karî yan li malê çavdêrîya bi awayekî veşartî, tacîza bi têlefonê, diyarên nexwastî û ji der û dora kesekî xwastina zanîyarîyê.
Tacîz dikare li ser qurbanîyî tesîra fizîkî û psîkologîk bike.

## Bibelgekirina tundîyê

Karîna îsbatkirina bûyera tacîzê giring e. Wek nimûne, qurbanî dikarin rojaneyeke tevgerên tacîzên kesîn bigirin (wek nimûne diyarî, not, axaftinên têlefonan), qurbanî dikarin mirovên li der û dora xwe (cîran, heval yan patronek) jê haydar bikin û dîmenên/fotografên ekranan ên peyamekî (WhatsApp, Facebook filan) bikişînin.

## Gerîna li destekê

Navenda desteka şîretkarîya qurbanîyî (Opferhilfe-Beratungsstelle) dikare destekê peyder bike. Pisporek dikare di gavên wan ên pêş de rewşa qanûnî zelal bike û destekê bide wan.
Kesên ji bajarê Bernê dikarin bi Beşa Tundî û Tacîza Navmalbatî re têkilî bikin (Fachstelle Häusliche Gewalt und Stalking)

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-bern.ch/ku/haeusliche-gewalt/stalking

# Zewaca bi zorê û kêrkirina jinê (sinet)

Zewaca bi zorê û kêrkirina jinê (sinet) li Swîsrayê qedexekirî ne. Digel dezgehên pisporbûyî navendên desteka şîretkarîya qurbanîyan (Opferhilfe-Beratungsstellen) jî destekê didin.

## Zewaca bi zorê çi ye?

Eger kesek bi zora malbata xwe û bêyî xwastina xwe bi yekî/yeka din re bizewice ev wek zewaca bi zorê bi nav dibe. Zewac dikare betalbûyê bê diyarkirin. Mirov herweha di bijartina dewamkirin yan devjihevberdana zewacê de serbest in. Eger kesek bêyî xwastina xwe zewacekê dewam bike ev jî wek zewaca bi zorê bi nav dibe.
Nimûneyên kirina bi zorê ev in: gef, şantaj, zexta psîkologîk yan tundîya fizîkî.
Zewacên bi zorê li Swîsrayê qedexekirî ne.

## Alîkarî

Beşa pisporê neteweyî 'zwangsheirat.ch' ji qurbanîyan û profesyonelan re şîretkarîya veşartî miftîbelaş peyder dike: tora alîkarîyê bi rêya 0800 800 007 yan emaîla info@zwangsheirat.ch

## Kêrkirina jinê (sinet) çi ye?

Di kêrkirina jinê (sinetê) de derveyê rehma pîrekê tê kêrkirin. Awa û pêkanînên wê yên cuda hene. Zarokên qîzî yên sinetkirî û jin gelekê caran ji ber encamên leşsaxîyê û psîkologîk ên sinetê bijan in.
Kêrkirina pîrekê (sinet) qedexekirî ye. Dêûbav herweha eger li derveyê Swîsrayê jî kêrkirina (sinetkirina) zarokên xwe bi rê bixin jî doz li wan bê vekirin.

## Alîkarî

Tora li dijî Kêrkirina Rehma Pîrekê (Netzwerk gegen Mädchenbeschneidung) zanîyarîyê pêşkêş dike û bi kesên kilîl re têkilî dike. Carîtas Swîsra ji malbatên qurbanî dre xizmeta şîretkarîya miftîbelaş û veşartî pêşkêş dike. 042 419 23 55 / beratung@maedchenbeschneidung.ch
Navendên şîretkarîya desteka qurbanîyî (Opferhilfe-Beratungsstellen) jî dikare destekê pêşkêş bike.

## Qaçaxa mirovan çi ye?

Di qaçaxkirina mirov da, kesek bi awayekî taybet tê wergirtin, azadiya wî tê sînordarkirin û dikeve ber keysbazî û neçêbikaranînê.
Hin nimûneyên neçêbikaranînê ev in:

- Neçêbikaranîna cinsî, wek mînak leşfiroşiya neçarî
- Neçêbikaranîna karî û neçarkirin bo karkirin di şert û mercên ne-însanî da, wek mînak li malê, miqatebûn, cotkarî, avakirin an jî xizmetkirina li mêvanan
- Neçarkirin bo pêkanîna kiryarên sûcê û karên din weke dizî, parsekî yan pêşkêşkirina organê bedenê

Jin, mêr, salmezin û zarok dikarin bibin goriyên qaçaxkirina mirovan. Pirraniya goriyan di esas da ji welatekî din in. Ew bi soz û qirarên derew ber bi Swîsê va dihêne kişandin. Qaşo "Kurên evîndar" jî jinên ciwan digihînin vê baweriyê ku evîndar in û wan dinazînin. Piştra ew bi awayekî sîstematîk jinên ciwan girêdayî dikin, wan dixin tecrîdê û wan neçar bi pêkanîna kiryarên cinsî yan sûcê dikin. Bêyî liberçavgirtina vêya mijar li Swîsê qanûnî yan neqanûnî ye, wan mafê xwe yê şêwirîn û piştevaniyê hene.

## Alîkarî

Rêveberiya Qaçax Jinan û Koçberiya Jinan nasyar bi FIZê di warê qaçaxa mirovan da pispor e. Navenda pispor piştevaniya giştalî û mala parastî raberî kesên ziyandîtî dike - bêyî berçavgirtina vêya ku kesên ziyandîtî digel rayedaran hevkarî dikin an na. Jin, mêr û kesên trens dikarin rawêjkariyê wergirin: 044 436 90 00 / WhatsApp 076 596 15 63 / contact@fiz-info.ch
Navendên şêwirînê yên piştevaniya ji qurbanîyan jî alîkarî didin. Şêwirîn nihênî û belaş in. Derfeta wergerê heye.
Ji bo ragihandina bo polîs: Telefona 112 an jî qereqol

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-bern.ch/ku/haeusliche-gewalt/zwangsheirat-und-maedchenbeschneidung

# Temen û Miqatebûn

Tundûtûjîya nav malê hema wisa bandorê li kesen extiyar û ên ku hewcedarê miqatebûna ji xizman in, dike.

## Tuntûtûjî di extiyarbûnê da

Tundûtûjiya derûnî, leşî, darayî û zayendî jî di pêwendiya navbera kesên temendirêj da diqewime. Ji bo têkilîdanîna digel şêwirmend ti wextî dereng nîne. Navenda şêwirînê zanyarî û piştevaniyê raber dike.
Giring: Di esas da pispor ti karekî bêyî rezamendiya kesê/a têkildar bi cih nayîne. Ev biryar dide ku qonaxên din çi ne.

## Binpêkirina sînoran di miqatebûnê da

Kesên ku ji ber temen, nexweşî yan astengdariyê hewcetî bi alîkariyê hene, pirrî caran tûşî binpêkirina sînoran ji aliyê endamên miqateder ên malbatê dibin. Girêdayîbûnên cûrbicûr, tecrîd, berevaniya sînordar û daxwazên zêdebarî dibine sebeb belavbûna tevgerên hêrişkerane. Piştevanî ji beşên pirpor di peydakirina rêkarê da.

## Piştevanî di pevçûn û şidetê da

Kesên zirardîtî dikarin ji cihên cûrbicûr alîkariyê wergirin. Kesên nêzikî qurbanîyan jî dikarin ji van ofîsan rawêjkariyê wergirin. Nihênî û belaş

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-bern.ch/ku/haeusliche-gewalt/alter-und-pflege